# Bultena heftane

# 14/10/2023

Email: **starmalper13@gmail.com**

Facebook:kongra star-مؤتمر ستار

Youtube: kongra.star22@gmail.com

**Nûçeyên ji cîhanê**

## Li Arjantînê bi hezaran jinan li peyama Besê Erzîncan guhdarî kirin

Li bajarê Barîloche yê Arjantînê bi hezaran jin di Kombûna Jinê ya Pirneteweyî ya 36'emîn de li hev kom bûn.

https://anfkurdi.com/jin/li-arjantine-bi-hezaran-jinan-li-peyama-bese-erzincan-guhdari-kirin-174728

Çavkanî:ANF



## Axaftina hunermenda Filistînî Emily Jacir a li Berlînê hat betalkirin

Axaftina hunermend û fîlmçêkera Filistînî Emily Jacir a ku dihat plankirin li Berlînê bê kirin hat betalkirin. Emily Jacir beriya ku axaftina xwe betal bike, parve kir ku ew bi awayekê bi êş haya wê ji bêdengiya li hemberî komkujiya gelê Filistînê heye.

https://jinhaagency.com/ku/rojane/axaftina-hunermenda-filistini-emily-jacir-a-li-berline-hat-betalkirin-41477

Çavkanî:JINHA



## Ji bo Jîna Emînî û 'Jin, Jiyan, Azadî' Xelata Sakharovê

Parlamenta Ewropayê Xelata Azadiya Fikrî ya Sakharovê da jina Kurd a ciwan Jîna Emînî ya hate qetilkirin û tevgera jinê ya 'Jin, Jiyan, Azadî'.

https://jinhaagency.com/ku/rojane/ji-bo-jina-emini-u-jin-jiyan-azadi-xelata-sakharove-41529

Çavkanî:JINHA



## Jinên Mexmûrê: Em tu caran teslîmiyetê qebûl nakin

Jinên Wargeha Penaberan a Şehîd Rustem Cudî Mexmûrê êrişên dewleta Tirk a dagirker şermezar kirin û bi gotina ‘Em tu caran dev ji doz û berxwedana xwe bernadin’ soza têkoşîna xwe dubare kirin.

https://jinhaagency.com/ku/rojane/jinen-mexmure-em-tu-caran-teslimiyete-qebul-nakin-41414

Çavkanî:JINHA



## Siyasetmedar Zekiye Îlbasan di bin çavan de rastî tacîzê hat!

Alîkara Hevseroka Giştî ya DBP’ê Zekiye Îlbasan diyar kir ku di binçavan de ji aliyê polîsan ve hatiye tecîzkirin, di ketina girtîgehê de jî lêgerîna tazî lê hatiye kirin û da zanîn ku hewl dane wê bişînin koguşa ku kesên edlî lê dimînin.

https://jinhaagency.com/ku/rojane/siyasetmedar-zekiye-Ilbasan-di-bin-cavan-e-rasti-tacize-hat-41416

Çavkanî:JINHA



# ‘Her jin dikare li ser bedena xwe biryarê bide’

Tevî ku di sala 1973’an de li Tûnisê kurtaj hat qanûnîkirin jî jin hê jî ji xizmeta tenduristiyê ya ku dixwazin bêpar in. Doktor Hadia Belhac got: “Azadiya her jinê heye ku li ser bedena xwe biryarê bide”

https://jinhaagency.com/ku/rojane/her-jin-dikare-li-ser-bedena-xwe-biryare-bide-41421

Çavkanî:JINHA




# Li Îzmirê jin ji bo aştiyê meşiyan

Platforma jinan a Îzmirê bal kişand ser êrîşên Îsrailê û li hember sekna desthilat AKP a du rû ku li dijî gelê Kurd polîtîkayên şer di meşine helwest nişan dan.

https://jinhaagency.com/ku/rojane/li-Izmire-jin-ji-bo-astiye-mesiyan-41427

Çavkanî:JINHA



# ['Mafê zarokan ên mal, tenduristî, perwerde û lîstikê hatin binpêkirin']

Komeleya Pêşî Zarok, di rapora xwe ya li ser Semsûrê ku yek ji bajarên herî zêde di erdheja 6'ê Sibatê de zirar dîtibû, diyar kir ku mafên zarokan ên mal, tenduristî, perwerde û lîstikê hatine binpêkirin.

https://jinhaagency.com/ku/rojane/mafe-zarokan-en-mal-tenduristi-perwerde-u-listike-hatin-binpekirin-41430

Çavkanî:JINHA





# ['Krîza xaniyan' a xwendekarên zanîngehê kûrtir dibe]

Xwendekara zanîngehê Başak Dogan, diyar kir ku ji ber kirêya zêde û kêmahiya yurdan pirsgirêka xaniyan zêde bûye û got: “Dema em bertek nîşan didin jî li pêşberî xwe polîsan dibînin. Em hîs dikin ku dema em nefesê digrin jî zext li ser me heye.”

https://jinhaagency.com/ku/rojane/kriza-xaniyan-a-xwendekaren-zaningehe-kurtir-dibe-41432

Çavkanî.JINHA



## Jinên Şengalê piştgirî dan berxwedana Rojava

Li gundê Xelef ê Şengalê çalakiya konvedanê bi armanca piştgirîdayîna berxwedana gelên Bakur û Rojhilatê Sûriyeyê ya li dijî êraşên bi dirûşma, "Her der Rojava, her der berxwedan" di roja duyemîn de berdewam kir.

https://jinhaagency.com/ku/rojane/jinen-Sengale-pistgiri-dan-berxwedana-rojava-41433



## Rojnamevana Lubnanê Cîzal Xûrî wefat kir

Rojnamevana Lubnanê Cîzal Xûrî ku nexweşa penceşêrê bû jiyana xwe ji dest da.

https://hawarnews.com/kr/haber/rojnamevana-lubnan-czal-xr-wefat-kir-h79845.html

Çavkanî:ANHA



# 'Butçeyê ne ji şer ji jinan re veqetînin'

ÎZMÎR - Platforma Jinan a Îzmîrê li dijî şerê li çar aliyên cîhanê daxuyanî dan û gotin ew aştiyê dixwazin. Jinan gotin:"Butçeyê ne ji şer ji jinan re veqetînin."

https://jinpanel.com/kr/HEMU-NUCE/content/view/219530

Çavkanî:JINNEWS




# Hûn der barê pençeşêra malzarok û memikan de çi dizanin?

NAVENDA NÛÇEYAN - Bi armanca hişmendî û agahdarkirina nexweşiyên pençeşêra malzarok û memikan, Platforma "Kontrol bi te re ye bersiv di gen de ye" hat avakirin. Platorm li dijî pençeşêrê dibêje "Em rûpelek nû vedikin."

https://jinpanel.com/kr/HEMU-NUCE/content/view/219550

Çavkanî:JINNEWS



## Biryar çi dibe bila bibe wê ji bo Akbelenê li ber xwe bidin

MÛGLA - Biryara doza derbarê aqûbeta 230 donim erde nav Çiyayê Akbelenê de hat taloqkirin. Jinan biryar nirxandin û gotin encam çi dibe bila bibe wê bexwedana xwe bidomînin, axa xwe biparêzin.

https://jinpanel.com/kr/HEMU-NUCE/content/view/219552

Çavkanî:JINNEWS




## Sivîlên li Rojava tên qetilkirin nayên dîtin

ÎZMÎR - Êrişên Tirkiyeyê yên li hember Rojhilat û Bakurê Sûriyeyê ji 5'ê Cotmehê ve didomin. Jinan balkişandin ser êrişan û diyar kirin ku bi awayekî xurt zext li Tirkiyeyê nayên kirin.

https://jinpanel.com/kr/HEMU-NUCE/content/view/219558

Çavkanî:JINNEWS




## [Lîstikvaneke jin û derhinerekî Îranî hatin qetilkirin](https://jinpanel.com/kr/HEMU-NUCE/content/view/219568)

NAVENDA NÛÇEYAN - Lîstikvana îranî Vahîde Mihemedîfer û hevjînê wê derhênêr Dariûş Mehrcûyî di mala xwe de bi îşkenceyê hatin û hatin qetilkirin.

https://jinpanel.com/kr/HEMU-NUCE/content/view/219568

Çavkanî:JINNEWS



## [Siyasetmedarên girtî: Em ji tecrîda li ser gelên xwe re dibêjin na](https://jinpanel.com/kr/HEMU-NUCE/content/view/219580)

ENQERE - Siyasetmedarên girtî bi peyama ku ji bo kongreya Partiya Çep a Kesk şandin kongre silav kirin û gotin, “Weke kesên ku ji bo pêşxistina aştiyeke bi rûmet li Kurdistan, Tirkiye û Rojhilata Navîn; "Em ji şer, dagirkerî, îstîsmar û tecrîda li ser gelên me re dibêjin 'na'."

https://jinpanel.com/kr/HEMU-NUCE/content/view/219580

Çavkanî:JINNEWS



## ‘Bi têkoşîna femînizmê emê di nava piştevaniyê de bin’

Kom û saziyên Femînîst daxuyaniyek hevbeş weşandin û diyarkirin ku li dijî têkoşîna Filistinê hemû cûrên nêzîkatiyan red dikin û gotin: “Bi têkoşîna Filistinê, emê bi her alî re di nava piştevaniyê debin.”

https://jinhaagency.com/ku/rojane/bi-tekosina-feminizme-eme-di-nava-pistevaniye-de-bin-41462

Çavkanî:JINHA




## ‘Jinên Mexrib ji bo piştgiriya gelê Filistînê meşiyan’

Jinên Mexrib ji bo protestokirina êrîşên Îsraîlê yên li dijî sivîlên li Şerîda Xezayê meşiyan. Di meşa protestoyê de bal hat kişandin ku Îsraîl bi guhnedana peymanên navneteweyî sûcê şer kiriye û bang kirin ku dawî li dagirkeriyê were.

https://jinhaagency.com/ku/rojane/jinen-mexrib-ji-bo-pistgiriya-gele-filistine-mesiyan-41461

Çavkanî:JINHA



## [‘Li Şerîda Xazeyê 50 hezar jinên ducanî ji xizmeta tenduristiyê bêpar in’](https://jinhaagency.com/ku/rojane/li-Serida-xazeye-50-hezar-jinen-ducani-ji-xizmeta-tenduristiye-bepar-in-41455)

Fona Nifûsê ya Neteweyên Yekbûyî (UNFPA) diyar kir ku li Şerîda Xazeyê 50 hezar û 500 jinên ducanî vê mehê dê biwelidin û diyar kir ku jinên ducanî hewcedarê parastin û çavdêriya tenduristiyê ya lezgîn in.

https://jinhaagency.com/ku/rojane/li-Serida-xazeye-50-hezar-jinen-ducani-ji-xizmeta-tenduristiye-bepar-in-41455

Çavkanî:JINHA




## [Jinên Rojhilatî: Nikarin destkeftiyên li Rojava tûne bikin](https://jinhaagency.com/ku/rojane/jinen-rojhilati-nikarin-destkeftiyen-li-rojava-tune-bikin-41453)

Jinên Rojhilat diyar kirin ku bi bedelên ku li Bakur û Rojhilatê Sûriyeyê hatine dayîn de destkeftiyên mezin hatine bidestxistin û destnîşan kirin ku ev destkeftî bi êrişên dewleta Tirk nayên tunekirin.

https://jinhaagency.com/ku/rojane/jinen-rojhilati-nikarin-destkeftiyen-li-rojava-tune-bikin-41453

Çavkanî:JINHA



## Jinên ku tevlî kongreyê bûn: Abdullah Ocalan nefesa gelan

ENQERE - Jinên beşdarî 4'emîn Kongreya Mezin a Partiya Çep a Kesk bûn diyar kirin ku Rêberê PKK'ê Abdullah Ocalan "nefesa" gel e û xwestin ne tenê tecrîda li ser wî bi dawî bibe, her wiha ji bo azadiya fîzîkî jî bangawazî kirin.

https://jinpanel.com/kr/HEMU-NUCE/content/view/219620

Çavkanî:JINHA




## Zilamê ku bi kuştina jinekê dihate tewanbarkirin, hate berdan!

Li bajarokê Xebat ya ser bi Hewlêrê zilamek ku bi tometa xwekuştina jinekê ciwan dihate tewanbarkirin, piştî 6 mehan hate berdan.

https://rojnews.news/ku/?p=282680

Çavkanî:ROJNEWS



# [Tîma Futbolê ya Jinan a Amedsporê, Beşîktaşê têk bir]

Tîma Futbolê ya Jinan a Amedsporê li seha xwe Tîma Futbolê ya Jinan a Beşîktaşê 1-0 têk bir.

https://rojnews.news/ku/?p=282868

Çavkanî:ROJNEWS




# [Mamostayên jin, bi îradeyek xurt beşdarî xwepêşandanan dibin,]

Mamostayên jin ên ku nêzî mehekê ye di nava boykot û çalakiyan de cih digirin ragihandin ku divê hemû mamostayên jin dakevin qadan û bi rêya xwepêşandan û çalakiyan mafên xwe bidestbixin.

https://rojnews.news/ku/?p=282645

Çavkanî:ROJNEWS



## Pispora Yasayî: Yek ji sedemên sereke yên telaqdanê, zewaca dibin temenê 18 salî deye

Pispora Yasayî Rasil Selman diyar kir ku yek ji sedemên herî sereke yên zêdebûna buyerê dev ji hev berdana jin û zilaman (telaqdanê) li welat, zewaca jinên dibin temenê 18 salî û bikaranîn madeyên hişber in ku di meha borî de 9 hezar dozên telaqdanê hatin qeydkirin.

https://rojnews.news/ku/?p=282416

Çavkanî:ROJNEWS




## Xwepêşandanên li Suweydayê didomin

Xelkê Suweydayê heta niha jî xwepêşandanên xwe berdewam dikin û daxwaza guhertina siyasî, edalet, wekhevî û pêkhatina biryara 2254’an dikin.

https://jinhaagency.com/ku/rojane/xwepesandanen-li-suweydaye-didomin-41480

Çavkanî:JINHA



# [Rojnamevana Filistînî: Divê rastî bêalî bên ragihandin](https://jinhaagency.com/ku/rojane/rojnamevana-filistini-dive-rasti-beali-ben-ragihandin-41474)

Rojnamevana Filistînî Saba Ebû Amra bal kişand ser nêrîna çapemeniya cîhanê ya der barê êrişên Îsraîlê yên li ser Şerîda Xezayê de, diyar kir ku ji bo pêşî li komkujiyên din ên li dijî mirovên bêguneh bê girtin, divê rastî bi awayekî bêalî bên ragihandin.

https://jinhaagency.com/ku/rojane/rojnamevana-filistini-dive-rasti-beali-ben-ragihandin-41474

Çavkanî:JINHA



# [Çalakvanên Rojhilatî ji bo parastina destkeftiyan bang kirin](https://jinhaagency.com/ku/rojane/Calakvanen-rojhilati-ji-bo-parastina-destkeftiyan-bang-kirin-41472)

Çalakvan Soraya Şerîfî têkildarî êrîşên dewleta Tirk yê li ser Bakur û Rojhilatê Sûriyeyê anî ziman ku cîhan çavên xwe ji êrîşên dagirker re girtiye û got ku divê gelên azadîxwaz ji bo parastina destkeftiyên li Rojava xwedî helwest bin.

https://jinhaagency.com/ku/rojane/Calakvanen-rojhilati-ji-bo-parastina-destkeftiyan-bang-kirin-41472

Çavkanî:JINHA



# [‘Divê rojnamegerên jin dengê xwe zêdetir bidin bihîstin’](https://jinhaagency.com/ku/rojane/dive-rojnamegeren-jin-denge-xwe-zedetir-bidin-bihistin-41467)

Rojnamegera bi tecrubeya 30 salan Samia Abdel Majeed Al-Aghbarî diyar kir ku piştî şerê li Yemenê zehmetiyên rojnamegerên jin zêde bûne û wiha got: "Divê rojnamegerên jin li hemberî zehmetiyan têkoşîna xwe mezin bikin, dengê xwe derxin."

https://jinhaagency.com/ku/rojane/dive-rojnamegeren-jin-denge-xwe-zedetir-bidin-bihistin-41467

Çavkanî:JINHA




# [Bi sedan jinan ji bo Abdullah Ocalan name nivîsandin](https://jinpanel.com/kr/HEMU-NUCE/content/view/219694)

NAVENDA NÛÇEYAN - RJAK'ê bi kampanyaya nameyan a ji bo Rêberê PKK'ê Abdullah Ocalan piştevaniya azadiyê kirin û bi sedan jinan name nivîsandin.

https://jinpanel.com/kr/HEMU-NUCE/content/view/219694

Çavkanî:JINNEWS



## ['Hêzê ji kincên xwe yên leşkerî digirin']

AMED - Siyasetmedaran têkildarî polîtîkayên şerê taybet ên hikûmetê li hemberî jinan bi taybet li bajarên Kurdistanê pêş, diyar kirin ku kiryar hêzê ji kincên xwe yên leşkerî digirin û diyar kirin ku rê li ber van sûcan bê ceza tên tên hiştin hatiye vekirin.

https://jinpanel.com/kr/HEMU-NUCE/content/view/219658

Çavkanî:JINNEWS




## [Di Roja Cîhanî ya Gundiyan de hemû mirovahî deyndarê keşfa çandiniya jinê ne]

Ji ber ku di dema borî de jinên gundî faktorên sereke yên dîtin û geşepêdana çandiniyê bûn, di van salên dawî de Neteweyên Yekbûyî rojeke cîhanî ji bo çareserkirina rewşa jinan bi taybetî jinên gundî destnîşan kir.

https://rojnews.news/ku/?p=282890

Çavkanî:ROJNEWS



## [Jinên Kerkûkê: Tirkiye dewletek dagirkere, divê Kurd dijî êrişan rabin ser xwe](https://rojnews.news/ku/?p=282990)

Jinên Kerkûkê derbarê êrişên dewleta Tirk a dagirker de dibêjin; “Dewleta Tirk di hemû êrişan de jin û zarokan dike hedef, dema li Filistînê şer çêdibe, hemû cîhan dengê xwe radibe, lê ji bo Kurdan her kes bêdenge. Tirkiye dewletek dagirkere.”

https://rojnews.news/ku/?p=282990

Çavkanî:ROJNEWS



## [Jinên Belûcistanê daxwaza azadiya Werîşe Mûradî kirin](https://jinpanel.com/kr/HEMU-NUCE/content/view/219673)

NAVENDA NÛÇEYAN - Tevgera Jinên Belucistanê ji bo endama KJAR'ê Werîşe Mûradî ya di 1’ê Tebaxê de li Sineyê ji aliyê îstîxbarata Îranê ve hat revandin banga azadiyê kir.

https://jinpanel.com/kr/HEMU-NUCE/content/view/219673

Çavkanî:JINNEWS



## Jinên Mexribê: Ji bo gelê Filistînê divê em dengê xwe bilind bikin

Jinên Mexribê ji bo şermezarkirina komkojiya Îsraîlê ya li ser nexweşxaneya Xezayê daket qadan û gotin ku komkojiya nexweşxaneyan, şerekî li dijî mirovahiyê ye divê kampanyayên ji bo piştevaniya gelê Filistînê bên destpêkirin.

https://jinhaagency.com/ku/rojane/jinen-mexribe-ji-bo-gele-filistine-dive-em-denge-xwe-bilind-bikin-41503

Çavkanî:JINHA



## Cerdevan Cemîl Turk keça xwe qetil kir

Li Agiriyê cerdevanê teqawîtbûyî Cemîl Turk bi çekê keça xwe Dîlan û kurê xwe Ercan Turk gulebaran kir. Di êrîşê de Dîlan Turk jiyana xwe ji dest da, birayê wê jî bi giranî birîndar bû.

https://jinhaagency.com/ku/rojane/cerdevan-cemil-turk-keca-xwe-qetil-kir-41495

Çavkanî:JINHA



## [Aktîvîstên Libyayî: Dewleta Tirk Libyayê dixe bin mêtinkariyê](https://jinhaagency.com/ku/siyaset/aktivisten-libyayi-dewleta-tirk-libyaye-dixe-bin-metinkariye-41493)

Aktîvîstên jin ên Lîbyayê destwerdana dewleta Tirk a li welatê xwe weke rengekî mêtingeriyê nirxandin û xwestin jin li dijî van polîtîkayan dengê xwe bikin yek.

https://jinhaagency.com/ku/siyaset/aktivisten-libyayi-dewleta-tirk-libyaye-dixe-bin-metinkariye-41493

Çavkanî:JINHA



## [Endama Yekîtiya Jinên Filistînî: Êrişên Îsraîlê plana sedsalê ye](https://jinhaagency.com/ku/rojane/endama-yekitiya-jinen-filistini-Erisen-Israile-plana-sedsale-ye-41492)

Parazvana mafên mirovan a Yekîtiya Jinên Filistînî Celine Mohtaseb got ku ew ji bo zelalkirina hûrgiliyên êrişên li Xezayê û zêdekirina hevgirtina bi gelê Filistînê re dixebitin û êrîşên Îsraîlê wek plana sedsalê nirxand.

https://jinhaagency.com/ku/rojane/endama-yekitiya-jinen-filistini-Erisen-Israile-plana-sedsale-ye-41492

Çavkanî:JINHA



## Newroz Uysal: Divê em durûtiya Tirkiyeyê teşhîr bikin

Parlamentera HEDEP’ê ya Şirnexê Newroz Uysal diyar kir ku êrîşên dewleta Tirk li ser Bakur û Rojhilatê Sûriyeyê ne rewa ne û got ku divê rêbazên vê yekê teşhîr bikin werin dîtin, li dijî van êrîşan divê dengê hevbeş derbikeve.

https://jinhaagency.com/ku/rojane/newroz-uysal-dive-em-durutiya-tirkiyeye-teshir-bikin-41491

Çavkanî:JINHA



## Mêrê ku bi destur ji girtîgehê derket jinek qetil kir

TRABZON - Mêrê bi navê M.S yê bi destur ji girtîgehê derket, jina bi navê Banesha Mamîsheva qetil kir.

https://jinpanel.com/kr/HEMU-NUCE/content/view/219787

Çavkanî:JINNEWS



## Valentina Skafar: Heta têkoşîna jinan tunebe şoreşek rastîn jî nabe

ENQERE - Ji Koma Partiya Çep a Ewropayê Valentîna Skafar kongreya Partiya Çep a Kesk, têkoşîna gelê Kurd û şerê li Rojhilata Navîn nirxand û wiha bal kişand ser rola jinan û got: “Di vê tabloya global de rola jinan gelek girîng e. Di têkoşîna Kurdan de bi taybet rola jinên Kurd gelek girîng e. Ez dikarim vê bêjim bêyî wan tu şoreş pêk nayê. Bêyî têkoşîna jinan şoreşek rastîn ne pêkan e.”

https://jinpanel.com/kr/HEMU-NUCE/content/view/219738

Çavkanî:JINNEWS



## ‘Pergala hevserokatiyê wek tehdîd dibîne’

AMED - Hevşaredara Farqînê Naşîde Toprak balkişand ser armanca tayînkirina qeyûman û girîngiya rêveberiyên xweser û wiha got: “Pergala hevserokatiyê wek tehdîd dibîne. Modela rêveberiyên herêmî ya hemû nasnameyan dihewîne hedef tê girtin."

https://jinpanel.com/kr/HEMU-NUCE/content/view/219728

Çavkanî:JINNEWS



# [Dayika şehîda Newrozê Zekiye Alkan jiyana xwe ji dest da](https://anfkurdi.com/jin/dayika-sehida-newroze-zekiye-alkan-jiyana-xwe-ji-dest-da-174788)

Dayika Zekiye Alkan ku beriya 33 salan li Amedê di Newrozê de bedena xwe da ber agir û şehîd bû, Îsmet Alkan ji ber krîza dil jiyana xwe ji dest da.

https://anfkurdi.com/jin/dayika-sehida-newroze-zekiye-alkan-jiyana-xwe-ji-dest-da-174788

Çavkanî:ANF



# [Jinan li Amedê atolyeya 'lîberalîzm û rêxistinbûyînê' li dar xist](https://jinhaagency.com/ku/rojane/jinan-li-amede-atolyeya-liberalizm-u-rexistinbuyine-li-dar-xist-41525)

Lijneya Jinan a Rêveberiyên Herêmî ya HEDEP'ê, ji bo nîqaşkirina polîtîkayên jinan ên herêmê atolye li dar xist.

https://jinhaagency.com/ku/rojane/jinan-li-amede-atolyeya-liberalizm-u-rexistinbuyine-li-dar-xist-41525

Çavkanî:JINHA



# Ji sedî 70’ê kesên li Xezayê mirin jin zarok û extiyar in

Li gorî daxuyaniya hikumeta Xezayê di êrîşa Îsraîlê de di nava 24 saetan de 678 Filistîniyan jiyana xwe ji dest dane. Li Xezayê hejmara miriyan gihîşt 3 hezar û 478’an. Hezar û 300 kes weke ‘winda’ hatin aşkerakirin.

https://jinhaagency.com/ku/rojane/ji-sedi-70-e-kesen-li-xezaye-mirin-jin-zarok-u-extiyar-in-41524

Çavkanî:JINHA



# Li Yemenê jin ji bo piştevaniya gelê Filistinê daketin qadan

Jinên li bajarê Taîza Yemenê ku qetlîamên Îsraîl yên li Xezayê pakaniyî protesto kirin, diyar kirin ku ew bi gelê Filistînê re ne û bertek nîşanî bêdengiya navneteweyî ya li hemberî qetlîaman dan.

https://jinhaagency.com/ku/rojane/li-yemene-jin-ji-bo-pistevaniya-gele-filistine-daketin-qadan-41522

Çavkanî:JINHA



## Jinên Tûnisî: Êrîşên Îsraîlê hemû xetên sor derbas kir

Jinên Tûnisî diyar kirin ku êrîşên Îsraîlê hemû xetên sor derbas kiriye û ji bo piştevaniya jinên Filistînî banga mezinkirina berxwedanê kirin.

https://jinhaagency.com/ku/rojane/jinen-tunisi-Erisen-Israile-hemu-xeten-sor-derbas-kir-41521

Çavkanî:JINHA



## Jin li Stenbolê li dijî şer, komkujî û qirkirinê meşiyan

Jin bi hev re bi hêz in, êrîşên Îsraîlê yên li ser Fîlîstînê bi meşekê protesto kirin û peyam dan: "Em vê durûtiya ku li Filistînê ji şer re na, li Rojava û Karabaxê erê, tehemûl nakin."

https://jinhaagency.com/ku/rojane/jin-li-stenbole-li-diji-ser-komkuji-u-qirkirine-mesiyan-41517

Çavkanî:JINHA



# [Hezkirina xwe ya hunerê vediguhêze tabloyên porselen](https://jinhaagency.com/ku/cand-u-huner/hezkirina-xwe-ya-hunere-vediguheze-tabloyen-porselen-41514)

Hunermend Maya Fares, hezkirina xwe ya ji bo hunerê pêş dixe û xemlên navdar diafirîne. Maya Fares bi qursên ku vedike hunera çînî hînî gelek jinan dike.

https://jinhaagency.com/ku/cand-u-huner/hezkirina-xwe-ya-hunere-vediguheze-tabloyen-porselen-41514

Çavkanî:JINHA



# [Atoleyeya jinan a rêveberiyên herêmî pêk hat](https://jinpanel.com/kr/HEMU-NUCE/content/view/219866)

MÊRDÎN - Jinên di atolya jinan a rêveberiya herêmî de mafê axaftinê girtin, balkişandin ser tecrîda desthilatdariyê û polîtîkayên şer yên li Kurdistanê tên meşandin.

https://jinpanel.com/kr/HEMU-NUCE/content/view/219866

Çavkanî:JINNEWS




## Li Enqereyê jinek hat qetilkirin

ENQERE - Li navçeya Dîkmen a Enqereyê mêrê bi navê Ahmet Ayan jina bi navê Munever Ayan ya pê re zewicandî qetil kir.

https://jinpanel.com/kr/HEMU-NUCE/content/view/219859

Çavkanî:JINNEWS



## Li Îdirê bûyera destdirêjiya sîstematîk

ÎDIR - Li Îdirê derket holê ku 6 mêr nêzî 4-5 mehan destdirêjî li zarokekê kirine û bi darê zorê fûhûşê lê dane kirin.

https://jinpanel.com/kr/HEMU-NUCE/content/view/219809

Çavkanî:JINNEWS



## Mamosteyên jin li dijî hikûmetê di rêzên pêş yên xwepêşandanan de ne

Mamosteyên jin yên Başûrê Kurdistanê ku di rêzên pêş yên xwepêşandanan de ne, bi qêrîna dirûşmeyên li dijî desthilatdarên Herêma Kurdistanê diqêrin, dibêjin “Şermezariyek mezin ku hikûmet bi nanê welatiyan dileyize û wê meha 10 mûçeyê meha 7 bidin.”

https://rojnews.news/ku/?p=283308

Çavkanî:ROJNEWS



## Daxuyaniya Tora Têkoşîna li dijî Tundiyê hate astengkirin

Li Amedê Tora Têkoşîna li dijî Tundiyê li dijî êrîşê Rojava û Filistinê daxuyanî bidin ji ber panqereta ku peyva ‘Rojava’ lê hatibû nivisandin polîsan asteng kir. Lê belê destur hat dayîn ku mêrên ji mizgeftê derketin bi meşin.

https://jinhaagency.com/ku/rojane/daxuyaniya-tora-tekosina-li-diji-tundiye-hate-astengkirin-41546

Çavkanî:JINHA




# [‘Têkoşîna jinên Rojava di pêşketina têkoşîna jinên Rojhilat de xwedî roleke girîng e’](https://jinhaagency.com/ku/rojane/tekosina-jinen-rojava-di-pesketina-tekosina-jinen-rojhilat-de-xwedi-roleke-giring-e-41545)

Aktivîsta feminist S.M diyar kir ku têkoşîna li Rojava bûye mînak ji bo hemû cîhanê û Rojhilatê Kurdistanê û bal kişand ku ji ber vê yekê dewleta Tirk Rojava dike hedef.

[https://jinhaagency.com/ku/rojane/tekosina-jinen-rojava-di-pesketina-tekosina-jinen-rojhilat-de-xwedi-roleke-giring-e-41545](https://jinhaagency.com/ku/rojane/tekosina-jinen-rojava-di-pesketina-tekosina-jinen-rojhilat-de-xwedi-roleke-giring-e-41545)

Çavkanî.JINHA





# [Samîra Xurremî: Tendirustiya ruhî ya jinên Îranê di metirsiyê de ye](https://jinhaagency.com/ku/tenduristi/samira-xurremi-tendirustiya-ruhi-ya-jinen-Irane-di-metirsiye-de-ye-41544)

Derûnînas Samîra Xurremî diyar kir ku zextên hikumeta Îranê di serî de jin û zarok rewşa tendirustiya ruhê kesan xira kiriye û got: “Ji ber fîşan tendirustiya ruhî ya jinan dikeve metirsiyê.”

[https://jinhaagency.com/ku/tenduristi/samira-xurremi-tendirustiya-ruhi-ya-jinen-Irane-di-metirsiye-de-ye-41544](https://jinhaagency.com/ku/tenduristi/samira-xurremi-tendirustiya-ruhi-ya-jinen-Irane-di-metirsiye-de-ye-41544)

Çavkanî:JINHA




# [Jinên Efganistanê ji bo xwe qad ava dikin](https://jinhaagency.com/ku/civak-jiyan/jinen-efganistane-ji-bo-xwe-qad-ava-dikin-41539)

Selam Rehiyaft ya li Efganistanê ji bo jinên ku ji aliyê Talîbanê ve ji karê xwe bûne bi armanca piştevaniyê li gel 10 jinên din kafe-restoran vekiriye, dibêje: “Me jinan soz daye ku Talîban çi bibêje bila bibêje em ê xebatên xwe berdewam bikin.”

https://jinhaagency.com/ku/civak-jiyan/jinen-efganistane-ji-bo-xwe-qad-ava-dikin-41539

Çavkanî:JINHA



# ‘Ji bo zarok û malbatan divê bernameyên piştevaniyê bên lidarxistin’

Şêwirmenda cîvakî Hairiya Farac Al-Fercanî diyar kir ku divê ji bo zarok û malbatên ji karesata lehiyê bi bandor bûne piştgiriya derûnî û bernameyên rehberiyê bên lidarxistin.

https://jinhaagency.com/ku/rojane/ji-bo-zarok-u-malbatan-dive-bernameyen-pistevaniye-ben-lidarxistin-41537

Çavkanî:JINHA



# Rojnamegerên jin êdî xwedî mal in: Werin em vê hevgirtinê xurt bikin

Cemiyeta Rojnamegerên Jin ên Mezopotamyayê ku di Roja Rojnamegerên Jin ên Kurd de hatiye avakirin, bi armanca guhertina zimanê mêr û hevgirtina li dijî binpêkirinên mafên rojnamegerên jin dest bi rêwîtiya xwe kir.

https://jinhaagency.com/ku/rojane/rojnamegeren-jin-edi-xwedi-mal-in-werin-em-ve-hevgirtine-xurt-bikin-41536

Çavkanî:JINHA



**Nûçeyên herêmî**

## [Komxebata diyalogê ya jinên ciwan bi dawî bu]

NAVENDA NÛÇEYAN - Yekitiya Jinên Ciwan a Bakur û Rojhilatê Sûriyeyê komxebata ku bi dirûşma 'Bi pênc rêgezên jin azadî, Jin, Jiyan, Azadî' li salona civînê ya MSD'ê ya li Reqayê bi beşdariya 100 delegeyan ji Bakur û Rojhilatê Sûriyeyê û derveyî herêmê li dar xistibû bi dawî kir.

https://jinpanel.com/kr/HEMU-NUCE/content/view/219788

Çavkanî:JINNEWS




## [Jinên ku beşdarî çalakiyan bûn: Heta Rêber Apo azad nebe jin azad nabin]

Îro li gelek bajarên Bakur û Rojhilatê Sûriyeyê gel ji bo azadiya fîzîkî û tecrîta girankirî ya li ser Rêberê Gelê Kurd Abdullah Ocalan li qadan bûn. Her wiha çalakiya konvedanê ya ku li bajarê Qamişlo hat destpêkirin di roja xwe ya 3'emîn berdevam dike.

https://jinhaagency.com/ku/rojane/jinen-ku-besdari-calakiye-bun-heta-reber-apo-azad-nebe-jin-azad-nabin-41531

Çavkanî:JINHA



## ‘Em ê bi hevgirtinê şoreş û destkeftiyên jinan biparêzin’

Hevseroka kantona Girê Spî Fadîle Mihemed êrîşên ku li ser Eyn Îsa pêk hatin nirxand û got: “Li dijî êrîşên hewayî û wêrankirina binesaziyê jin, gel, ciwan, rêveberî û QSD yek in. Em ê vê hevgirtinê şoreş û destkeftiyên jinan biparêzin.”

https://jinhaagency.com/ku/rojane/em-e-bi-hevgirtine-sores-u-destkeftiyen-jinan-biparezin-41512

Çavkanî:JINHA



## Jinên li kampên Idlibê: Em di nava jiyana nediyar de ne

Jinên Îdlibê ku ji ber êrîşên dewleta Tirk û çeteyên girêdayî wê ji cihê xwe bûne, li kampan bi cih bûne diyar kirin ku ew di nava jiyana nediyar de ne û gotin: “Heta êrîş berdewam bikin, wê şert û mercên jiyana wan dijwartir bibe.”

https://jinhaagency.com/ku/rojane/jinen-li-kampen-idlibe-em-di-nava-jiyana-nediyar-de-ne-41511

Çavkanî:JINHA



# ‘Çirûska bîrdoziya azadiya jinan ronî da tevahî cîhanê’

Komîteya Perwerdeyê ya Kongra Star a Rojava yekemîn akademiya dewreya perwerdeyê ya bi navê Şehîd Zeyneb Saroxan vekir.

https://jinhaagency.com/ku/rojane/Ciruska-birdoziya-azadiya-jinan-roni-da-tevahi-cihane-41534

Çavkanî:JINHA



Kongra Star
21.10.2023